Sample test – Introduction to Northern Kurdish (Kurmanji)

You can answer the examination in English or Swedish

1. Translate the following text into English or Swedish (10 p.)

Navê min Gulçîn e. Ez 20 salî me. Ez diçime Zanîngeha Stenbolê. Ez li vir, li Stenbolê dijîm. Lê mala me li Mêrdînê ye. Dayik û bavê min li wir dijîn. Navê bavê min Hekîm e. Ew 45 salî ye. Navê dayika min Gulcan e û ew 43 salî ye. Bavê min dukandar e. Dukana wî pir mezin nîne. Dayika min naxebite. Ew bermalî ye. Dayika min her sal tê vira. Min xuşkek heye. Navê wê Zelîxa ye û ew 10 salî ye. Çavên wê reş in û porê wê dirêj e. Ew diçe dibistana seretayî. Ez di tatîlan de diçime cem wan.

2. In the sentence *Min xuşkek heye* the 1st person singular is "the possessor". Change this sentence into the other five persons (you, he/she, we, you, they). (5 p.)

3. Find two ezafe-constructions in text in no. 1. How is the masculine and feminine ezafe different from each other. (3 p.)

4. How is the indefinite singular form marked in Kurmanji? Find one example in the text. (2 p.)

5. What form of the verb is *diçime*? Conjugate this verb in the same tense form but for all persons. (4 p.)

6. *Ew* is a personal pronoun, 3rd person singular, direct (rectus) case. What are the personal pronouns in the direct case for the other persons? (5 p.)

7. Translate the following text into English or Swedish (10 p.)

Naz: Ha, ez dixwazim xeberekê bidime we.
Helîn: Xeberêrê ye înşellah. De bêje Naz.
Naz: Roja înê birayê min Rênas tê ji Kurdistanê.
Serdar: Rastî! Welleh divê em vê pîroz bikin.
Naz: Ê baş e vêga! Ez dixwazim we mêvan bikim. Şeva şembiyê, li mala min. Hûn dikarin bên?
Serdar: Pir baş dibe! Ez dikarim bêm. Ez dixwazim Rênasî bibînim.
Selîm: Naz tu xwarinên xweş çêdikî?
Naz: Zêde ne xerab im bo xwarinçêkirinê. Ez dikarim tirşik û qelîsêlkê çêkim ji we re. Tu dixwazî bêyî an ne?

8a. There are eight present subjunctive forms in the text. Find these and give also the infinitive form of the verb (there are only 5 different verbs). (8 p.)

8b. Conjugate the verb *nivisîn* 'to write' in the present subjunctive, all persons. (6 p.)

9. There is one imperative form in the text above. Which one? (1 p.)

10. Change the sentence *Ez di tatîlan de diçime cem wan* to the future tense. (2 p.)

11. Translate the following text into English or Swedish (10 p.)

Siyabend ji nava wê deviyê rabû çû kete nava deviyeke din û xwe dirêj kir ku rakeve, lê kir û nekir êdi xewa wî nehat. Erê hêj di xew re neçûbû, dîsa ew dengê berê hat guhên wî mîna ku yek bangî wî bike. Rabû ser lingan li derûdora xwe nihêrî lê tu tişt nedît, dîsa xwe li erdê dirêj kir. Dîsa ew deng bihîst; gava kir ku rabe ser lingan, dît ku zilamek li ber lingên wî sekiniye. Dema Siyabendî ew dît, hinek tirsiya.

12. In the text there are several verb forms in the simple past. Find six of them and give the infinitive for each verb as well. (6 p.)

13. Conjugate the verbs *çûn* and *dîtin* in the simple past tense form. Include also the relevant personal pronouns. (8 p.)